

## Piştf Erdhejê: Alîkarîya Başbûyîna Zarokên Piçûk

Zarokên piçûk, zarokên hê nû dest bi birêveçûyîna kirine û zarokên pêşdibistanê – heta bebek -, gava tiştên nebaş dibin pê dizanin û serbûhûrîya wan tê bîra wan. Piştf bûyereke bitirs, em di tevgerên wan de bi himbizî guherînan dibînin. Dibin bêtir bigirîn, xwe bi mirovî ve daynin û nexwazin em herin, hêrsokî bibin, li kesên din bixin, nikaribin xew bikin, ji tiştên ew berê ji wan gazindan nekirin dikarin bitirsîn, hûnerên xwe ji dest bidin... Guherînen bi vî awayî nîşana veyana wan a alîkarîyê ne. aha hindê rêyên em dikarin alî wan bikin.

**E**wlehî - Pêşîn li ewlehîyê hûr bibikn. Zarokê we yê piçûk gava hûn xwe di ewlehîyê de bihisin...

- Wî hembêz bikin yan bihêlin ew nêzî we raweste
- Jê re bibêjin gava tişt tirsnak bin yan zehmet bin hûn ê pê bilebikin. Bi zarokên hê nû hênî axaftinê dibin re peyvên hêsan ên wek "Bavik li vê derê ye" bi kar bînin.
- Wî ji dîmenên tirsnak ên tîlevîzyonê û ji axaftinên tirsnak dûr bikin.
- Tiştên tîn zanîn ên wek sitraneke hûn her du jî pê dizanin yan gotina çîrokekê bibêjin.
- Let him know what will happen next (to the degree that you know). Bikin ku ew bizane dê ji niha şûn de çi bibe (bi qasî zanîna xwe).
- Bi kêmayî bera ji bo dema nivistinê demeke we ya texmînî hebe: çîrokek, di'ayek, dema hembêzê.
- Gava tu jê dûr bikevî wê bi kesên nas re bihêle.
- Ji wî re bibêje tu biçî ku derê û tu ê kingê vegeirî.

**B**ihêlin bera hest bîn dayîn der

- Gava ku zarokên gênc fikaran dikin yan jî ditirsîn gelekê caran "dibilizin." Zarok, wek rêyeke xwastina alîkarîyê "dibin rol bikin." Ji bîr nekin! Hestên zehmet=Tevgerên zehmet in.
- Bihêlin zaroka we hesta xwe bi nav bike: "tirsîyayî", "bi kêf", "bi hêrs", "xemgîr." Ji wê re bibêje pêhisîna bi vî awayî tişteki asa ye.
- Awayê rast î tevgerê nîşanî zarokê xwe bidin, wekî "Hêrsbûna te asa ye lê lêxistina min ne asa ye."
- Alî zarokê xwe bikin ew hêrsa xwe bi bikaranîna peyvên, leyîstikan yan wêneyan bêyî êşandinê bide der.
- Ji bo alîkarîya bi tiştên dilşadbûna we û zarokê we re li ser tiştên baş dibuhurin biaxifin.

**B**era çavê we li serektîya zarokê we be

- Ji zarokên cihê re tiştên cihê divên. Hindê zarok divên li der û dorê baz bidin lê hindê divên bîn hembêzkin.
- Ji bo hûn fehm bikin ka zarokê we çi divê li zarokê xwe guhdarî bikin û bera çavê we li tevgerên wî be.

**B**ikin ku bera zarokê we di gava erdhejê de û dû re çi qewimîye, vebêje.

- Xwedîtiya çîrokekê alî zarokê we dike ew tiştên qewimî bi nav bike û çêtir bi wan bikare.
- Zarok, ji bo çîrokên xwe vebêjin leyîstikê bi kir tînin. Wek nimûne, dibin ji bo nîşandayîna awayê erdhejê blokan biavêjin. Ji bo nîşandayîna awayê dûrketina ji we ajelên pêleyîskê ji hev cihê bikin.
- Ne bi tenê ji bo gav bi gav nîşandayîna û vegotinê, herweha ji bo awayê nîşandayîna pêhisîn û vegotina we her dûyan tevî zarokê xwe bibin.
- Gava we çîrokê vegot çav li serektîya zarokê xwe bidêrin. Gava çîrok zehmet be dibe ji zarokê we re navberên bêhnvedanê bivên: wek bazdayîna li der û dorê, hembêzbûyîna, leyîstina tişteki din. Ev ne xem e. Gava xwe kar kir dê vegere çîrokê.
- Dibe ku temaşekirina li leyîstikên zarokên xwe yan guhdarîkirina çîrokên wan ên li ser erdhejê zehmet be. Eger guhdarîkirina bêyî xemgîrîyê ji bo we zehmet be destekê bistînin.

**T**or – Bi kesên destekdêr re, civatê re, kulturê re û rîtuêlan re dîsa têkilî bikin.

- Tiştên hêsan ên wek çîrokeke naskirî, sitranek, di'ayek yan 'adetên malbatê awayê jîyana we tîne bîra we û zarokê we û we bi hîvî dike.
- Eger hûn endamê komeke wek dêrekê bin, ji bo awayê dîsa têkilîkirinê kefteleftê bikin.
- Gava hûn hay ji xwe hebin hûn dikarin bi awayê herî baş alî zarokê xwe bikin. Gava we bivê, ji kesên din destekê bistînin.

**Z**arokê We, We Divê! Ev yek tiştê herî giring ê dibîranîna ye.

- Soz bidin zarokê xwe ku hûn ê pê re bin.
- Fikara zarokan a dûrketina ji we û xwe bi we ve vekirin tişteki berbelav e.
- Eger bivê hûn ji zarokê xwe dûr bikevin, jê re bibêjin hûn ê ta kingê û kingê lê vegeirin. Eger mumkin be tişteki xwe yan wêneyekî xwe yê ku zarokê we karibe lê xwedîtiyê bike jê re bihêlin.
- Ku hûn nikaribin tiştin rast bikin jî, dê bûyîna bi zarokê we re alî wî bike.